

PKK û PYD hincetan didin Tirkîyê da ku êrîşî deverên me bike

Kurdistan Silava Xidir



Di dema dawî de, Tirkîyê gefa operasyoneke nû li ser deverên di jêr desthilata Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD dike, û dibêje ew dixwaze devereke

ewle li wan navçeyan ava bike. Helbet ev gef berya operasyonên li ser her yek ji Efrîn û Serêkaniyê û Girêspî jî dihatin kirin, û PYD nedkarî tişteki bike û ew dever jî radestî Tirkîyê û grûpên ser bi

wê ve kirin. Welatîyekî Kobanê dibêje, PKK û PYD bi hezaran xelkê Kobanê û bi darê zorê derxistin xwepêşandanan, û al û simbolên PKK hatin bilindkirin, û ev yek bi xwe jî hincetê dide Tirkîyê

heta ku êrîşî deverên me bike, ev sînyaro berya operasyona Serêkaniyê û Girêspî û Efrînê jî rû dan. PKK dixwaze rewşa Kurdistanê Sûriyê têk bide, ew jî bi rêya siyasetên xwe yên şewt.

Welatîyekî din jî dibêje, pêwîste PKK dest ji Kurdistanê Sûriyê û xelkê wê berde û xebata xwe bibe Bakurê Kurdistanê, û êdî xelkê me biryar û çarenivîsa xwe bidin.

Revandina zarokan bo karê leşkerî tawaneke mezin e

Ehmed Elî -Kurdistan

Encûmena Êzidiyên Sûriyê radigihîne, “Keçeke biçûk a Êzidî ji aliyê rêxistineke ser bi PYD an (PKK) ve hat revandin”. Her wiha dibêje, “Jiyana koçberên li herêmên di bin kontrola Rêveberiya Xweser û PYDê de, ji metirsiyê ne dûr e.” Encûmena Êzidiyên Sûriyê duhî di daxuyaniyekê de ragihand, “Rêxistina Ciwanên Şoreşger, Sîlva Hemîd Cafer ku ji gundê Basûfanê yê Efrînê, li ser riya dibistanê li taxa Şêx Meqsûd a Helebê hat revandin û ber bi cihekî nediyar ve birin. Li gor wê encûmenê, xwediyê Sîlva ji bo zanîna




çarenivîsa keça xwe, li deriyê hemû saziyên ewlekarî û îdarî, yasayî û kesên ku pêwendiya wan bi PYDê re hene dane, lê ew negihîştine ti encamê. Encûmena Êzidiyên Sûriyê tekez dike ku Sîlav Hemîd Cafer nexweş e. Encûmena Êzidiyên Sûriyê destnîşan dike “Piştî çar salan ji koçberkirina bi deh hezaran xelkê Efrînê ber bi herêmên di bin kontrola Rêveberiya Xweser li Helebê û kampên Şehba de, êşkere bû ku jiyana wan ji metirsiyê ne dûr e. Rêxistina Ciwanên Şoreşger a Partiya PYD (PKK) bi awayekî terorîstî bi revandina zarokên

temen biçûk ji destên dayikên wan û birina wan bo eniyên nediyar berdeyam e”. Herwiha dibêje: “Revandina mirovan bi giştî û zarokan bi taybetî di hemû ayînen asmanî, yasayên mirovî û prensîbên mirovî de reftareke bêexlaqî û kiryareke terorîstî ya şermazarkirî ye.” Diyar dike jî: “Heta Dadgeha Tawanan a Navdewletî jî, di xala (B) û (H) ya benda 8ê ya destûra xwe de, leşkerkirina zarokan, çi neçarkirin û çi bi dilxwazî, ji aliyê hêzên çekdar ve wek tawaneke şer û tawanên li dijî mirovahiyê dibîne.” Da zanîn jî “Berpîrsê leşkerî yê Hêzên

Sûriya Demokratîk bi xwe jî di sala 2019an de daxwaznameya Netewên Yekgirtî îmze kiriye û soz daye ku zarok û biçûkan nêrevînin û her kesê di bin 18 saliyê de yekser ji yekîneyên PYD derxin.”

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) di daxuyaniyekê de daxwaz ji HSDê û rêxistinên mafên mirovî yê taybet bi mafê zarokan dike, revandin û biçekirina zarokan rawestînin. Di daxuyaniya ENKSê de hat, “Tevî ku revandina zarokên temenbiçûk, bi awayekî berfireh tê şermazarkirin û li gorî yasayên navdewletî û

mafên mirovan jî, tê tawanbarkirin, lê belê çekdarên PYDê di bin navên cuda de bi kiryarên xwe yê tirsnak ên li dijî zarokên gelê Kurd berdeyam in.” ENKSê diyar dike, dawî haleta revandina zarokan, revandina zaroka Êzidî ya bi navê Sîlva Hemîd Cafer a ji xelkê gundê Basûfanê yê herêma Efrînê bû ku li taxa Şêx Meqsûd a Helebê hat revandin û tevî ku xwediyên li dû şopa wê digerin, lê heta niha çarenivîsa wê ne diyar e. Di daxuyaniyê de hat gotin: “Ligel ku ENKS van kiryarên terorîstî, tevîkirina zarokan di çalakiyên leşkerî de û dîrxistina wan ji xwendinê şermazarkirina Sîlvaya biçûk û zarokên din yê wê wê dike û bang li rêxistinên mirovî yê têkildar dike ku dawî li van kiryanan binin.” Her wiha ENKS daxwaz ji serkirdayetîya HSDê dike ku li gor belgeyên Netewên Yekgirtî û “Banga Cenêvê” ya ku wê îmze kiriye, rê li ber leşkerkirina zarokan bigire û wan ji malbatên wan û xwendinê re vegeirîne. Welatîyek li ser vê mijarê dibêje, revandina zarokan tawaneke mezine derheqê mirovatîyê, û pêwîste di zûtirîn dem de ev yek were rawestandî û rêxistina bi navê ciwanên şoreşger were sizadan. Divê hêzên PYD pabendî beyanameyên navdewletî bibin, PYD û çekdarên ser bi wê ve bi van kiryarên xwe rewşa navçeyê têk didin û dixwazin ew xelkê mayî jî koçber bibin. Welatîyekî din jî dibêje, diyardeya revandina zarokan di ji destpêla avakirina PKK û aliyên ser bi wê ve heye, û ew dixwazin malbat û civaka Kurdî li Kurdistanê Sûriyê jînav biçê û êdî civakeke jihevketî hebe, da ku bi kêfa xwe kiryarên xwe encam bide û sûdê ji wê yekê bibîne.



Jin çawa bi destê PKKê hatine terorkirin



Mahir Hesen

Armanca min ew e ku tawanên hatine kirin ji aliyê PKK ve li Kurdistan bi belge û berhev bikim, da ku em wan pêşkêşî pêwendîdar pêşerojê bikin û him jî nîfşê bêt da ku karibin dadmendiyê pêk bînin, û bikarin beşdarî peydakirina delîlan li ser kesên ku di tawanên ku pkk li her çar parçeyên Kurdistan de beşdar bûne bêne diyar kirin û mîletê me bi zana ku çi dibe Pir zehmete ku hemû dozên girêdayî tawanên cengê û tawanên dijî mirovahiyê kom bikim, û li rastiya tiştên ku li Kurdistan li ser destên PKKê qewimîn bi serpêhatiyên Endamên ji nava refê PKKê reviyane an jî veqetiyane û dijberiya wan dikin, tekez bikim. Engo çawa pkk bûye mîratek reş û sor û bi ser kurdan rijiyê ye, çi ji Kuştin û işkençe kirina ya sivilan, binpêkirinên domedar ji damezrandina PKKê û heya wek ez van gotine dinivîsinim, û him leşkerkirina bi darê zorê, kuştin û windakirina bi tîfalên bê sûnc û guneh. Em zêde dûr neçin û li ser terorkirina yek ji jinên di nava refê PKKê de rawestin û reşjiyana wê bidin xuya kirin. Serpêhatiyên Endamên PKK yên li dijî ramanê Ocalan trajediyek e! Lê belê jiyana Ayten Yildirim bi serê xwe trajediyek û bêtarek e. Ev nexweşî di Pirtûkekê de navê navîsandin û tu kes li hemberî trajediya Aytenê nikare wisa bê deng bimîne! Yan jî çavên xwe lê miç bike. Ji ber vê yekê ez ê li vir serpêhatiya

Aytenê bibêjim: Ayten Yildirim mamosteya Tunceliyê bû. Dilsoz û pêbawer û niştîmanhez bû, gelek levhatî û bedew bû, di gel endamên PKKê ew û hevjinê xwe Hamilî di 17ê Gulanê de ji ber operasyonekê hatin girtin. Piştî pêvajoya lêpîrsînê (nêzî çil rojan berdewam kir) Ayten di roja sêyemîn a ji doza Endamên PKK di zîndana Diyar bekirê de hat berdan, Ayten Hevalên xwe hembêz kir û got "li xwe xwedî derkeve" û çû. Çavên Aytenê tijî hêsir bûn, ji ber ku wê hevalên xwe li şûn xwe hiştibûn, yan jî ji ber ku bi bawer bû ku ew ê careke din hevûdu nebînin, hem kêfxweş bû û hem jî xemgîn bû. Heya ku çû êş di çavên wê de dixuya. Navê wê yê rastî Ayten Ozdemîr bû. Di 15.07.1959an de li Nazmiye hatiye dinê. Navê bavê wî Yusuf û navê diya wî jî Hayriye bû. Du bira û sê xwişkên wî hebûn. Piştî ku dibistana mamostetiyê ya Ayten Tuncelî qedand, li enstîtuya perwerdehiyê ya Çewlikê qeyda xwe kir. Di 03.03.1979 de bi Hamil Yildirim re dizewice. Wê demê Hamil bi awayekî profesyonel di nava PKK'ê de dixebitî û li herêma Elezîzê xwedî erk bû. Ayten Ozdemîr û hevjinê xwe di xanî bi kirê li Elezîzê bi cih dibin. Piştî serbest berdan wê ji zîndanê, Ayten li derveyî welat bi rêxistina PKKê re dîsa têkilî kir, tayînî Dîlokê kirin, li cihê ku çû dîsa hat girtin. Piştî demekê, derbasî Sûriyê bû, çû Şamê, ji wir xwe gihand geliyê Bekaayê û serpêhatiyên xwe yên dîtî û bihîstî ji hevalekî re got. Piştî wê tarî ye, kes rastiye nabêje. Şahidên wan hene, lê napeyivin. Yên dixwazin biaxivin hene, lê dibêjin feydeya wan çi ye û bêdeng dimînin. Dive mirov li dûv rastiye biçê û ne ewqas kul û derde heger jiyana xwe ji bo rastî û kurd û kurdîstnê de

bide. Ji çavderyekê Ayten li ser destên Kadroyên PKK rastî işkençe hatiye û navê yek ji yên ku bi vî karî rabûne Omer e (li gor zaniyariyan, nasnavê kesê ku li Akademiya Mahsun Korkmaz Gefê terorkirî li Sakîne Cansiz kiriye Guneyli Omer bû, îcar nedûre ev kes ew bi xwe be) Ji derek din hatiye diyar kirin ku "Ayten ji bo ku xwe ji vê zilmê xilas bike reviya, xwe spart rêxistineke Filistinî, nikarîbû bi zimanê erebî biaxive, belkî nikarîbû ji ber ku şerm dikir ku bibêje ka çi li wê hatiye kirin li ser destên hevalên wê yên PKKê. Dema ku PKKê bihîst ku Ayten li cem filistinîyan dimîne çûn û ji wan re gotin ku rewşa wê ya Psikolî ne baş e û pêwîstiya wê bi Psikoterapî heye û ew anîn. Kes nizane çawa hatiye terorkirine! Lê her kesê ku wê demê di nava PKK'ê de bû û li Lubnanê ma(kampa Geliyê Bekaa li Lubnanê) , dizanin ku Ayten bi çi awayî hatiye terorkirin. Û PKK ji bo xwe rûreş nederxe ew wek "dîn bû" da diyarkirin. Gor tune ye û nayê zanîn Ayten çawa hatiye kuştin. Belê, rêxistineke ku xwe wek nûnertiya mirovahiyê dibîne, mafên jinan diparêze, li wir jinên dîn li ser destên wan tene gulebarankirin û ev tiştêkî normal tê dîtî! Dema ku xebera terorkirina Ayten hat, hevjinê wê Hamil Yildirim li girtîgeha Amedê bû. Wê demê parêzerê wî jî tune bû, name û telefon hatin qedexekirin. Ziyaretvan jî ji her tiştî bêaqil bûn. Sala 1985'an bû, tevî ku rojek hevdîtîne tunebû jî, eskeran ji Hamil Yildirim re got, "Bi te re hevpeyvîn heye" û ew ji zîndanê derxistin. Wek M.Selîm Cîrgûkaya dibêje ku pir wext derbas nebû, Hamil vegeyriya. Eskrean ew xistin zîndanê, derî kilît kirin û çûn. Mihemed Selîm dibêje : ezê tenê

tiştê ku wî (Hamil) ji me re di zîndanê de got vedibêjim: "Eskeran ez ji vir birim rêveberiya girtîgehê. Ez ketim hundir, rêberê girtîgehê Bîrol Şen û birayê Cemîle Merkit Elî Ekber Merkit silav dan. Min got bi xêr hatî Elî ekber. Bîrol Şen got: 'Binêr Hamilî, bi baldarî li vî xortî guhdarî bike, PKK'ê hevjinê te kuşt, niha li hemberî wan helwestê nîşan bide, ez soz didim ku ez ê bi te re alîkarim'. Elî Ekber got: 'Abe, (bi zimanê tirkî wateya Abe, birayê gewra) xwişka min Cemîle, wê ez şandim, Ayten Abla kuştin.' Min Elî Ekber bêdeng kir, min got di vî karî de sivkatiyek heye û ez derketim." Wê demê em di bin zexteke mezin de bûn, endamên Komîteya Navendî ya PKK'ê Yildirim Merkit bi Şahîn Donmez re li ser daxwaza Îdareya Girtîgehê li heman qawîşê diman. Bi hemû hêza xwe hewl didan ku hemû kesên di nava PKKê de bi xiyanetê destnîşan bikin. Di Dadgeha Leşkerî ya Cezayê ya 7. de Yildirim Merkit û Şahîn Donmez li dijî Hamilî Yildirim û Mihemed Selîm û hemî xebatkarên dilsoz rabûn û îfade dan. Xwişka Yildirim Merkit Cemîle Merkit jî di nava PKK'ê de wezîfeyên girîng girtibû, di heman demê de mamoste bû. Li ser daxwaza rêxistinê di sala 1978'an de bi endamê PKK'ê Elî Haydar Kaytan re zewicî. Ji ber buyera leşkerî ya 12'ê Îlona 1980'yî çû derveyê welat. Di sala 1984'an de tevî rexneyên Koordînatore PKK'ê yê Ewropayê Çetîn Gungör a li dijî Ebdullah Ocalan bû ku digot "Di nava partiyê de dîktatoriya yek zilamî tê avakirin." (ezê bi berferhî li ser Elî Haydar Kaytan ê Cemîle merkit bi axivim) Bi baweriyek mezin haya Elî Haydar Kaytan û Çetîn Gungör ji tiştên ku li zîndana Amedê diqewime tune bûn. Çawa ku Hamil

Yildirim û rêhevalên wî ji tiştên li derve diqewimin nizanin. Tenê parêzeran nûçeya ku Yildirim Merkit îtirafkar e ji PKK'ê re ragihandin. Çawa ku Ebdullah Ocalan jî di pêşxistina hezkirina xwe di nav mîlet de hosta ye, yekser Çetîn Gungör, Cemîle Merkit û Şahîn Dönmez, Yildirim Merkit tewanbar kir: "Weke ku tê zanîn li girtîgehan bi rêya xayînen Şahîn û Yildirim hewl hat dayîn ku teslîmiyet were kirin. Ev her du xayînen ku ji bo jiyana xwe di nava tengasiyê de bûn, di kuştinkirina hevalên me yên berxwedêr de weke sîxor hatin bikaranîn. Li gorî zaniyaran ku kolonyalîstan dabûn wan, dixwestin ji girtîgehê derxînin nav partiyê. Li gorî soza ku hevserên leşkerê tirkan dabûn wan, di berdêla wê de dê canê wan rizgar bibe. Wan guncav dîtî ku wê yekê ji deverek ku ji kontrolê derketibû û li wir lihevhatinek serdest bû dest pê bikin. Bê şik Ewropa ji bo wê dikare bibe zemîna herî guncaw. Sedemeke din a hilbijartina wê herêmê jî ew bû ku paşxaneya mîrzayê ku berpîrsê yekîneya rêxistinî ya Ewropayê bû jî ji bo wê yekê guncaw bû. Bi vê hêmanê re rasterast an jî nerasterast têkiliyên xiyanetkarên Şahîn û Yildirim hebûn. Weke ku tê fêhmîkirin em li vir behsa Semîr (Çetîn Gungör) dikin." Dema birayê Cemîle Merkit, Elî Ekber li Ofîsa rêveberê Girtîgehê Bîrol Şen bû, ê ku bi salan işkençe li Kurdan kir ji Hamil Yildirim re got, "Xwişka Aytenê terror kirin", ev yek buye sedema gumana gelek endam û serkirdeyên PKK ku rayedarên dewleta tirk û Konseya PKKê a bi serweriya Ocalan têklîdarin û ji bo talankirin û wêrankirina rêxistin û tevgerên kurdî bi yek armanc û helwest rabûne.

Şoreşa Gulanê rûpeleke nû di dîroka xebata rizgarîxwaza Kurdistanê de vekir



Kurdistan

Şoreşa Gulanê di şert û merceke cuda bû, ku Kurd rastî şikestina derûnî, siyasî û serbazî bûbû. Zehmet bû di rewşeke wiha de, ku Şoreşa Îlonê piştî 15 salan di Adara sala 1975an bişike, careke din dest bi xebata çekdarî bibe. Lê nerîna serkirdeyên genc ên şoreşê, bi taybet Serok Mesûd Barzanî û Îdrîs Barzanî, fermanî di wê demê de karîna careke din xewna destpêkirina şoreşê bikin rastiyek. Serok Mesûd Barzanî bi boneya 46emîn salvegera vêketina Şoreşa Gulanê peyamek belav kir û tê de ragihand, "Vê şoreşê çespanî ku eger di qonaxekê de xebata gelê Kurdistanê ji bo demeke kurt rastî westanê hatibe, lê belê têkoşîn û xebata gelê Kurdistanê ti carî neşikiya û bi henase û hêzeke nû ji bo gihîştina bi azadiyê berdewam dibe." Serok Barzanî di peyama xwe de ragihand, "Şoreşa Gulanê gonaxeke girîng a berxwedana Pêşmerge û gelê Kurdistanê ye. Ev şoreş, berdewamî û hilgîrê peyama û armancên

Şoreşa Mezin a Îlonê bû. Vê şoreşê çespanî ku eger di qonaxekê de xebata gelê Kurdistanê ji bo demeke kurt rastî westanê hatibe, lê belê têkoşîn û xebata gelê Kurdistanê ti carî neşikiya û bi henase û hêzeke nû ji bo gihîştina bi azadiyê berdewam dibe. Ev azadî û destkeftên niha hene, berhemên xwîn û qurbaniyên gelê me di Şoreşa Gulanê û tevahiya şoreşên din in." Serok Barzanî dibêje: "Di çil û şeşmîn salvegera Şoreşa Gulanê de, pêzanîna min ji bo hemû têkoşer, Pêşmerge, rêxistinên navxwe û ew niştimanperweran heye yên ku bi fidekarane madîbûn û koçberî hilbijartin, qurbanî dan û bûne beşek ji şanazyên gelê me." Di berdewamiya peyame de, Serok Barzanî de got: "Di vê bîranîna pîroz de, silavê ji giyanê yekem Şoreşa Gulanê, şehîd Seyid Ebdulla Hacî Omeranî û hemû şehîdên Kurd û Kurdistanê re dişînim û her wiha silav li xweragirî û qehremaniya Pêşmerge ku bi xwîn û qurbaniyên xwe, serfirazî ji gelê me re aniyê." Herwiha



Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di salvegera 46emîn a Şoreşa Gulanê de peyamek belav kir û tê de ragihand, "Şoreşa Gulanê wek berdewamiya Şoreşa Îlonê, xewna dijminan a jinavbirina gelê Kurdistanê xiste gorê." Peyama Serokwezîr Mesrûr Barzanî: Bi boneya çil û şeşmîn a salvegera Şoreşa Gulanê, germîrîn pîrozbahiyar arasteyî Cenabê Serok Mesûd Barzanî, Pêşmergeyên qehreman, beşdarên şoreşê û

malbatên serbilind ên şehîdan dikim. Şoreşa Gulanê wek berdewamiya Şoreşa Îlonê, xewna dijminan a jinavbirina gelê Kurdistanê xiste gorê, ji ber wê ew peyameke bihêz a gelê Kurdistanê bû ku stem û dagîrkari red kir û ti carî dest ji mafên xwe yên rewa berneda, ji bo vê yekê jî qurbaniyên mezin dan û çendî destan di dîroka xebata gelê Kurdistanê de tomar kirin, ya diyartirîn jî, destana dîrokî ya Xwakurkê bi rêbertiya Serok Barzanî bû. Îro di demekê de ku

salvegera Şoreşa Gulanê bi bîr tînin, ku xebata gelê Kurdistanê ji bo parastin û berevanîkirina li destkeft û saziyên wî yên rewa berdewam e, pêwîst e gelê Kurdistanê bi hemû alî û pêkhateyên xwe berevaniyê li mafên xwe yên destûrî bikin ku bi xwîna hezaran şehîdan bi dest hatine. Di salvegera vêketina Şoreşa Gulanê de, bi rêz û pêzanîneke mezin hemû Pêşmergeyên qehreman û beşdarbûnê vê şoreşê bi bîr tînin, di serî de jî şehîdê serkirde Îdrîs Barzanî.